# Jîn

Jimara şeşê Heyva Çirîa Êkê 2006 Vercinye, Emrîke 

## Remezan



Nuke Remezan e. Ħemî hevalêt min yêt Kurd bi rojî ne. Eve 14 sale ez wan dibînim wekî bi rojî. Eve he ez dibînim u min çend pisîar hene.

Hevalêt min li demê rojê çi tiştî naxwin u bi rojî dibin. Belê piştî meẍreb ew gelek xwarinêt dixwin. Min guh lê bî ku biserrman li demê Remezanê pitir xwarinê u vexwarinê dikirrin u dixwin ji ħemî heyvêt dî yêt salê.

¿ ? Erê ev rêke baştir da miruv qedirê Xwidê bizanit? Erê mebesta rojîê ewe tu ne xwî yan tu bîra werîa feqîr u jara bikî? Heker kesek bi rojî bit çi cawazî heye heker bi şev bit yan bi roj bit? Ne baştir e heker bu dû sê roja me li gel miruv u hevalêt xu cejin kir ban u heker me Xwidê bu çakîê wî bu me supas kir ba? U ne çêtir e heker li heyva maî me cilik u xwarin u pare yêt zêde dan heval u miruv u cîran yêt feqîrtir in ji me? Buçî zêngîn hêş zêngîntir dibin u feqîr hêş feqîrtir dibin?

Ji berî nuke ez li gel maleka Kurd jîam. Spêdekê li demê Remezanê u piştî rojhelat, ez ji xew rabîm u jin u mêr dîtin têşt dixwar. "Ħêl!" min gut, "Remezan xilas bî?" "Ne," jinkê gutê, "belê me serêt xu ne şîştî ye ji berî rojhelat, u ji ber hindê em evru ne bi rojî ne."

¿ ? Erê mebesta rojîê ewe ku çend wextî ji rojhelat? Ma Xwidê ne bi reħm e?

Ji berî dû sê sala li demê Remezanê ez u hindek hevalêt xu çûîne sîkê. Piştî hingê ewan pêşnîare kir em pêk ve biçîn bixwîn. Ez mam guhişî! "Hîn ne bi rojî ne?" min pisîar kir. Ewan gute min, "Ne, em ħemî bê nivêj în u em ne şêîn bi rojî bîn. U pêtivî ye ew rojî yêt me negirtîn em bigirîn piştî Remezanê."

¿ ? Erê mebesta rojîê ewe em ne şêîn 'îbadetê Xwidê bikîn heker em paqij ne bîn? (Xwidê em husa çêkirîn!)

Hevaleka min nesaxîa şekirê hey. Parêz e pêtivî ye ew bi rojî nabit çunku dê gelek nesax bit. Belê qebîlnekirî ye rojî bihêlit. U dîmahî hindek car pêtivî ye biçite xestê (u li Emrîke ew gelek giran e!) u mala wê di xema seħeta wê dane.

¿ ? Erê mebesta rojîê ewe em bi xu ne baş bîn? U zerrerê bigehînîn gîanê xu?

Min guh lê bî hindek miruv ħeta tifa xu nada'îrin heker bi rojî ne.

¿ ? Erê mebesta rojîê ewe pêtivî ye ez pitir zêde bikim da Xwidê razî bit? Ma Xwidê bi vî awayî turre ye? Yan belê hindek miruv dijî êk u dû pêşbezî dikin da bizanit kî qanûnîtir e ji ħemîa?

Wextê ez li Kurdistanê jîam, min dîtin hindek pencerkêt xwaringeha bi rojnama girêdaî ne da rêbar yêt rojî ne bînin ka kî ne bi rojî ne. Belê min çend biçîk jî dîtî ne bi rojî ne bu cara êkê u rojîêt xu bi temamî digirin.

¿ ? Erê rojî tiştek e em bu miruvêt dî dikîn (u ew miruv dê bu me kirin xêr yan dê me hêne sizadan)? Yan rojî tiştek e em bu Xwidê dikîn (u Xwidê dibînit em çi bi dizîkî ve dikîn)?

Li demê Remezanê cilkêt jinka u kiçka bi sitartir in u ew mikîac nadeynin. Belê heker ne Remezan bit, hiçikêt wan piç piç korttir u dîwendartir dibin u kumlik u penterrun yêt wan tengtir dibin u mikîac u pirrç yêt wan dîartir in. Erê bab u mêr u bira çavêt xu li ser jinka u kiçka digerrînin u bu wan feriq nîne gel çi kesê hebit. Zelam u kurr jî seħ dikin reqîsê u bê guman hizirêt wan ne li ser jinêt wan in.

¿ ? Erê ew zelam qedirê jinêt xu u Xwidê digirin? Erê hêjaîyêt me ji televizîunê u ji ħemî tişt li ser internetê birîar dit u me divêt bizanin çend em dişêîn di jîana xu da xilas bîn (yêt gunneh e)? Yan hêjaîyêt me wekî hêjaîyêt Babê me li esmanê (ku em çêkirîn u ku ħe ji me dikit u ku qodiret da me da em bişêîn ferqîê bikîn)? Yan hêjaîyêt me wekî hêjaîyêt xirabîê ku divêt hêlûyî me vegerînit ħeta em bêjîn, "Ma vêca eve ne baş e" – da em bimînîn li gel wî her u her u diçîn cehnemê pêşve biçîne def Bab (Xwidê) ku pîruz e?

"Demê hîn rojîa digirin nav çavêt xu têk ne din, herweku dûrî dikin, çunku ew nav çavêt xu têk din da bu xelkî dîar bikin, ku ew bi rojî ne. Bi rastî dibêjime we, wan xelatê xu wergirtî ye. Belê demê tu rojîê digirî dêmê xu bişu u serê xu run bike, da bu xelkî dîar ne bit tu yê bi rojî, belê bu Babê xu yê neberçav, Babê te ewê nepenîya (bi dizîkî ve) dibînit, dê te xelat kit."
- Mizgînî ya Mettî 6:16-18

"Jîn" guvareke tête nivîsîn ji laê Şirînê. Heker te jimara guvarê bivêt, îmêla xu bu min virêke: jeenuazadi@cs.com
© 2006 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

# Azadîa rastî çi ye?

Azadîa rastî ewe ye: heker em Xwidê nas kîn u guhê xu bidînê.
Xwidê dev yê daî ye me da em bişêîn xwarinê bixwîn.
Xwidê çav yêt daî ne me da em bişêîn dinyayê bibînîn.
Xwidê guh yêt daî ne me da em guh li hewa u baran u balinde u strangutin bîn.
Xwidê ezman yê daî ye me da em bişêîn li gel êk u dû biaxivîn u Xwidê bi rumet bikîn u da em li gel êk u dû ragehandin u aştî çêkîn.
Xwidê dest yêt daî ne me da em zeȟmetê bibîn da keyfa wî biêt, u da em tiştêt req u nerim u zivir u ȟilî yêt bu me çêkirîn pê şa bibîn.
Xwidê hizir u bîr daî ne me da em bişêîn karekî baş u taybet bi kar bînîn u da em bişêîn pirra ava bikîn u wêna dirist bikîn u kiras u fistana neqiş bikîn.
Xwidê hewes wekî yêt wî daî ne me da em bişêîn ȟes bikîn u bigirîn u kenîn u turre bibîn.
Xwidê hiş u bîr daî ne me da em bişêîn bixwînîn u binvîsîn u nîşa miruvêt dî her wesa bikîn.

Xwidê tiştêt baş daî ne me: xwarin u vexwarin, şîkirin, leş u pirrç yêt can, u dinya ya rengîn da lê bijîn. Xwidê cilkêt ‘ewilî çêkirîn (bu Ademî u Ȟewayê). Xwidê divêt em nuke bi çêkirina wî ya can şa bibînîn – ev ‘edire he ye – u piştî em dimirîn Xwidê divêt em bi esmane ya bu me ȟazir dikit. U ew esmane dê milyon cara cantir bit da em bizanîn.

Belê heker em bihêlîn devêt xu li axiftina turre u nexuş u xirab gendelî bibin …
Heker em devêt xu bi kar bînîn da zeȟf bixwîn, u vêca bibîn qelew (u vêca me seȟeta xirab hebit) …
Heker em bihêlîn çavêt xu seȟkinê tiştêt veşartî u taybet (u vêca ji nav da ya pir e ji talan u çav xirabê u ȟesidîê) …
Heker em bihêlîn guhêt xu guh li direwa bibin …
Heker em bihêlîn ezmanêt xu nifrîn li Xwidê u li miruva bikîn …
Heker em ezmanêt xu bi kar bînîn da biaxivîn u mendehuş bikîn, belê mebestêt baş kar bikîn da em li dîf şul u rengêt baş biçîn …
Heker em destêt xu bihêlîn tembel dibîn …
Heker em destêt xu bi kar bînîn destê xu bikin tiştêt veşartî u taybet (u vêca hewesêt me neraserbar bin) ...
Heker em bihêlîn hizir u bîrêt xu bikevine peî hizir (fantazîe; xêyal) ya gunnehbar …
Heker em bihêlîn hewesêt xu me ȟikmî bikin pêşve em hewesêt ȟikmî bikîn …
Heker em hiş u bîrêt xu pavêjîn u pêşve ramanêt gendelî bînîn …

… paşî me azadîa rast ya xu berze kir.

Rojî tiştek baş e. Belê heker rojî ya te bibit berîkanê da bibînit kî dişêt bi rojî bit bi dîarbînî u bi gîanî raman u hewes u hizir (fantazîe; xêyal) yêt gunnehbar hebit, ma bi rastî mebesta rojî temam bikit? Erê ne dirist e rojî ‘îbadetê kirin bu Xwidê?

**Erê ma ew rojî ya ez dihilbijêrim, ne dişkandina zincîrêt çewtîê ne? U vekirna girî (werîs) ya barsula*, u azadkirna tengava u şikandina hemî barsula*? Erê mane dûê ku tu nanê xu li gel yê birsî nîvî kî, belingazê derbeder di xanîê xu da bihewîn u bi cilik êxistina wî rîsî tu dibînî xu u tu çavî ji miruvê xu yê hejar dane poşî (vegerîa)?**

- axiftina pêẍemberê Eş’îya 58:6-7

* **barsul**  ji darê çêkirî; barsul dû ga digirit da ew pêkve şul bikin bu cutîarê yan da tiştêt giran bikêşin. 


© 2006 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

# Estêre

Zimanê berî Eȟşuîruş Paşaî da ewê desthelata wî ji Hindê ȟeta Koş, gehiştî 127 herêm keftine dest paşaî. Rojekê ji jina xu gelek turre bî u jina xu ber da. Belê piştî hingê turrebîna wî hate temirandin u bê kes ma u jinek dî divîa.

Zelamekê Cihî, navê wî Murdexaî, bî. Eve hat bî êxisîr kirin ji Urşelîmê digel kumek êxsîra dî ewêt nebuxiz nasirê paşaê Babil êxsîr kirîn. Eve Cihî çavdêrîa kiça mamê xu Estêrê kir çunku Estêre sêwî bî. Ev kiçe geleka cuan u hêja bî, u Murdexaî xudan kir bî demê deyk u babêt wê mirîn. Ji ber fermana Eȟşuîruş Paşaî, Estêre birne qesira paşaî. Estêrê binîatê xu bu kesê ne digut çunku Murdexaî gut bîn.

Paşaî dilê wî gelek kefte Estêrê pitir ji hemî jinka. Herwesa pê razî bî u tanca paşatîê dana di ser serê wê u bî jina wî.


ji laê Gulzar Saliȟ 2005

Piştî hingê Eȟşuîruş Paşaî qedir u qîmetê zelamekê (navê wî Hamanê) bilindtir u zêdetir lê kir ji hemî heval u hugirêt wî ji seruka pitir lê hat. U bi fermana paşaî li nav beyna zelamêt paşaî ewêt li ber dergehê paşaî dirawestan sucde bu Hamanî dibirin li dîv fermana paşaî. Belê Murdexaî qebîl ne kir sucdê bu Hamanî bit yan xu bu bişkênit. U Hamanê gelek ji wî turre bî. Demê agehdar bu wî ku Murdexaî Cihî ye ji xu ne girt sizaî biditê birîar da ku nifşê Cihîya ne hêlêt betaybet ew Cihîêt dibin paşayetî ya Eȟşuîruş da xu cih. Hamanî gute Eȟşuîruş Paşaî, "Milletekê hey dinav paşayetî ya te da belav desturê wan wek desturê hîç milletekê dî nîne u ew fermanêt paşaî bi cih naînin çênabit paşa kirbar u bu çûna wan ji hizira xu bibit. Heker paşaî pê xuş bit, fermanekê derbêxit bi nehêlana wan yan jî binbirna wan u ez dê deh hizar wezinêt zîvî bu xizîna paşayetîê pêşkêş kim ji bu binbirna wan." U paşaî gute Hamanî, "Ezê zîvî u milletî deme te. Hema herre tu çi li wan dikî bu te ȟelal e."

Murdexaî perekê fermana paşaî virêkir Estêrê u divîa beramber paşaî ȟazir bibit u hîvîa ji paşaî bikit belku vê birîara nehêlana Cihîya vekêşit u li wan biburit. Gute wê, "Heker te xu bê deng kir di vî wextî da, keyf u rizgar bîn bu Cihîya dê ji layekê dî ve êt. Belku tu u mala babê te dê bin birbin. Kî dizanit belku tu ya gehiştî ye textê paşaî bu demekê husa."

Estêrê gute wî, "Berdewam be Cihîya bike: Rojîa ji ber min bigirin, ne xwin ne vexwin di sê roja da bi şev u roj. Ezê weku we dê sê roja digel xizmetkarêt xu bi rojî bim. Paşî ez dê çime nik paşaî ser u jêr ji terzêt pê kirî, u heker ez mirim, ji xu eve ez mirim." U Murdexaî rabî çû ka Estêrê çi gutîê wesa reftar kir.

Li Roja sîê Estêrê cilkêt paşayetîê li bejina xu kir u çû li hola paşaî. Demê dîtî paşaî şîşka zêrî drêj kire wê. Pirsîara wê kir gutê, "Te çi ye u te çi divêt? Her şulekî te hebit dê bi cih êt heker bi xu nîva paşayetî bit." Estêrê bersiv da, "Heker paşaî xuş bit, evru tu digel Hamanî werin min xwarinek ya dirist kirî bu we." Paşaî gut, "Lez bikin herrin bêjine Hamanî da bête xwaringeha Estêrê amade bit bi vî rengî." Paşa u Haman her dû çûn li ser xwarina Estêrê amade bîn. Piştî xwarîn, Estêrê careka dî mêhvan kirin bu roja bêt u gute mêrê xu dê paşî xastina xu bu paşî bêjite wî.

Paşa u Haman her dû li mêhvandarî ya Estêre Xanim amade bîn. Demê wan mey vedixwarin, paşaî pirsîara wê şajin, "Te çi divîa ji min ya tu ȟez bîkî dê bu te bi cih êt? Pirsîara te çi bî heker nîva paşayetîê vegirit daxwazî ya te hêşta kême?" Bersiva da u gutê, "Heker te ez bivêm u li nik te bi biha, heker paşaî xuş bit ya min divêt tu jîana min parêzî! Herwesa ya min divêt tu milletê min rizgar bikî çunku ez u milletê xu emêt hatîne ber hêlan u kuştin u nehêlanê. Heker em weku xulama u carî ya hat ban, heker wana weku xulama u carî ya dî u pepîka ez da mit kim. Min ne diaxift, çunku ev birîare nabite egerek bu turrebîna paşaî." Eȟşuîruş gute Estêrê Xanim, "Ew kî ye wêrîaî evî karî encam bigehînit? Ew li kîve ye?" Estêrê Xanim bersiv da u gut, "Ew neyar u dijmine Haman e!!" Paşaî rabî ji vexwarin u bi turre bî gut, "Hamanî şeneq bikin." U bi Hamanî hate şeneq kirin.

Her duê rojê da Paşa Eȟşuîruş xanîê Hamanî dijminê Cihîya kire xelat bu Estêre Xanim. Murdexaî amade bî beramber paşaî çunku Estêre Xanimê gut bî paşa ku Murdexaî miruvê wê ye. Paşaî gustîra tila xu bi Murdexaî bexşîş kir. Gute Murdexaî, "Min divêt tu serperştîa kar u barê hebî yêt Hamanî bikî."

Piştî hingê paşaî ferman da u namayek nivîsî, u hêla Cihî harî karîa êk u dû bikin da xu biparêzin dijî dijminêt xu.

U ji ber hindê Estêre Xanim xu u milletê xu ji mirnê qurtal kir.


© 2006 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

# Îmêlêt We

Silav u têbînî,

Eger qebîl bikeî :

- Eger ev guvare bibîte guvareka giştî baştir e ji ku bes ya aynî bît?
- Eger em babeta bu te virêkîn dê wergirin yan ne?
- Eger pitir babet bihêne belav kirin baştir e?
- Gelek heval pirsîar diken ka çi core babeta hîn werdigirin (rewşenbîrî, kelturî, aynî …)

Digel rêzêt min u hevalêt min bu te,

Birayê hewe,

S.H.

Silav ji def Mesîḧ Îsa,

Roj baş xoşka min î Şirîn. U ez gelek supas dikim bu te u bu "Jîn". Îsayê Mesîḧ li gel te bit.

Bibure programê Kurdî me nîne.

Birayê te li gel Mesîḧ,

F.A.

Silav u rêz,

Bu Xuşka hêja Şirîn zorr be rêz,

Zorr supas bu nama te. Hîvî dikim tu ya baş bî u bi keyf u xuşî bî. Em ji te gelek xerîb bîn. Hîvî dikim em êk u dû dibînîn.

Qutabîyê te,

N.Y.H.

Supas mamosta Şirîn her sax bî.

Hîvîdar im tu her serkeftî bî di jîana xu de, bes min pisîarek heye ji xoşka xu. Dê çawa şêm îmêla xu virêkim bu guvara "Jîn"? Min divêt ez bizanim. Ez salekê li def te bûm li dewira havînê. 'Ewil sal bû ez levelê sîê ye bûm digel rêzgirtinê.

R.B.

Silav.

Ez gelek ji dil supasîa te dikim. Rast her karîyek mezin e ji def te bu me. Bes ez Ḧes dikem te u digel webseytek hebit da bişêîn pitir xizmete bikeîn. U ḧemî jimara te da belav keîn. U her wesa wana te da hebin. U ez yê amade me bu her kareke çunku ez ji qotabîyê kolîja perwerde me baş e kemputerî.

Eve dîarîyek biçîk ji def min bu guvara "Jîn".




Digel silava.

H.S.

Silav,

Supas bu te Şirîn. Ez jî dê bu ḧemî hevala virêkim.

Dest xuş. Silava li ḧemî hevala bike.

M.S.


© 2006 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

## Peyvêt Kurdî Berambera Inglîzî: Xwarin

### BERAMBERÊ →


**4** fêqî (m)
**5** afik (f)
**6** goşt (m)
**7** xwê (f)
**8** goştê gîanewerê avê
**11** tov (m)
**13** birinc (f)
**18** dew (m)
**20** vexwarin
**21** çay (f)
**22** şurbe (f) / metfînî (f)
**24** penîr (m)
**26** kêk (f)
**27** hestî (m)
**32** kotilk (f)
**37** zeyt (f)
**38** şîr (m)
**40** av (f)
**41** girar (f) / savar (m)
**43** nîsk (f)
**44** fravîn (f)
**45** hevîr tirrş (m)

### XWARÊ ↓


**1** pîtze / leȟimb'acîn
**2** nan (m) / semun (f)
**3** fisteq (f)
**5** lubî / fasolî (f)
**9** xuşav
**10** leymîn diz (f)
**12** zilate (f)
**14** îprax / dolme
**15** beqlewa
**16** têşt (f)
**17** filfil u biharat
**19** şerbet (f) / ava fêqî
**23** hîngivîn (m)
**25** hêk (f)
**28** nîvişk (m)
**29** mirebe (f)
**30** duşav (f)
**31** deramet (m)
**33** şekir (f)
**34** tirrşî / mexelele
**35** mast (m)
**36** şîv (f)
**39** kebab (f)
**42** xwarinêt sivik

# Food










*[Bersiva vê Beramberê li guvara meha bêt dê ête belav kirin.]*


© 2006 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

ji meha burî:

## Bersiva Pêxuşî


Tirêt pîrê ber
26 + 13 + 23 + 8 + 26 21 + 14 + 23 + 8 3 + 7 + 23

kuçkê pîrê xuştir e
16 + 27 + 5 + 16 + 8 21 + 14 + 23 + 8 31 + 27 + 25 + 26 7


ji mala mîrî.
15 + 13 18 + 2 + 17 + 2 18 + 14 + 23 + 14

## Bersiva Miruv

### Family




## Bersiva Miruvêt Te






© 2006 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

# Zanîarîêt Pêtivî bu Yarîkirna “Texmînê Bike!”


Ev yarîe yarîa wênê çêkirnê ye. Ĥemî kes dişên vê yarîê bikin. Dû miruv yan sê miruv yan her jimareka hebit. Herwesa tu dişêî wekî tîma yarîa bikî. Li destpêkê da pêtivî ye tu van karta jêk cida bikî. Van karta bi meqesê qet ke. Piştî qetkirna her perrekê dê te neh karte hebin.




## Destpêka Yarîê

Ew kesê kartê di destî da (ewê kartê hildigirit), pêtivî ye ew kesê dî yêt tîma wî nezanin çi li ser kartê ye. Demê tu seĥ dikî kartê babetekê (Kî? Kîve? Çi? Çawa? Buçî?) hilbijêre ku ew babeta tu dê wêne wê çêkî bu tîma xu. U çênabit tu biaxivî. Bes wênê çêke. Belê tîma te hewl didin bizanin ew wênê ya çi ye. (Babetê texmîn bike!) Belê hevberê te jî dê rengî tiştî çêkit ewê we hilbijartî. U dê wênê bu tîma xu wêne kit. U ew kesê yan tîmê bizanit ew wênê ye ya çi ye, ew dê pile wer girit.

**◄ Karta ewilî naête bi kar înan, belê taybete bu nimune da tu bizanî babetêt di yarîê çi ne:**



Kî? = bu wênêt miruva diête bi kar înan

Kîve? = bu wênêt ciha yan bajêra diête bi kar înan

Çi? = bu wênêt tişta diête bi kar înan

Çawa? = bu wênêt bizavkirnê yan bizavkirna diête bi kar înan

Buçî? = bu wênêt ĥemî karêt zeĥmet yan qurs diête bi kar înan

**Karta dûê wekî evê çende ye: ►**




(1) Ew kesê karte di destî da brîyarê dit, êk ji van babeta hilbijêrit. Bu nimune Çi? se’et, belê **çênabit tu hevberê xu agehdar kî yan bêjîê te çi hilbijartî ye**. Belê pêtivî ye tu bêjîe çi babete wekî “Çi?” yan “tişt” ku da bizanit babetê wî çi ye.

Piştî te babet hilbijartî, u te gute hevberê xu babete çi ye (Kî? Kîve? Çi? Çawa? yan Buçî?), dest bi çêkirna wênê bike. **U çênabit ebet biaxivit**, ew kesê karte di destî da u wênê çê dikit.

Li vî demî hevberê te bizavêt dikit da bizanit ka wênê çi ye ewê tu çê dikî. Dest bi axiftinê bike u mebesta wî ewe: bizanit ew tu çi çêdikî. U ew kesê wênê çê dikit pêtivî ye wênekî ku hevberê wî bizanit ew wênê ye çi ye.

Ev karê he herwesa diête kar înan bu yarîa tîma. Belê pêtivî ye ew kesê li êk tîmê da wênêt wek êk dirist bikin da yêt beramberî wana bizanin ew wênê ye çi ye.

Ev yarîe gelek xuş e u her kesêk dişêt vê yarîa bikit. Belê xuştir e dibit heker pitir ji çar kesa yarîa bikin.

(2) Herwesa tu dişêî me’naê wî tiştî bêjî, belê navî çênabit tu bêjî. U hevberêt te pêtivî ye bizanin u bêjin ka ew çi ye.

(3) Yan tu dişêî zarî vekî, belê çênabit tu biaxivî.

Ew kesê me’na yan qesa (bi nimune “se’et”) hilbijêrit yan bizanit, ew kese dê pileyekê wergirit, yan tîma wî pilê wergirit. U ew dest bi yarîê dikit.

Yarîekî xuş burîne! ☺


© 2006 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

## Texmînê Bike!

© 2006 by Şirîn - jeenuazadi@cs.com
not to be sold except by Şirîn; for free distribution only

KÎ? (miruv)
*Who? (people)*

KÎVE? (cih)
*Where? (location)*

ÇI? (tişt)
*What? (something)*

ÇAWA? (bizav)
*How? (action)*

BUÇÎ? (ȟemî tişt)
*Why? (miscellaneous)*

## Texmînê Bike!

© 2006 by Şirîn - jeenuazadi@cs.com
not to be sold except by Şirîn; for free distribution only

kiçik u kurrik
*girl and boy*

zevîêt birincî
*rice fields*

ferrheng
*dictionary (m)*

girtin, bigire
*close (v)*

'erd hejan
*earthquake*

## Texmînê Bike!

© 2006 by Şirîn - jeenuazadi@cs.com
not to be sold except by Şirîn; for free distribution only

jin u mêr
*wife and husband*

bajêr
*city (m)*

dîkil u mirîşk
*rooster and hen*

rîniştin xwar, rîne xwar
*sit down (v)*

meẍreb
*dusk (f)*

## Texmînê Bike!

© 2006 by Şirîn - jeenuazadi@cs.com
not to be sold except by Şirîn; for free distribution only

êxtîar
*elderly*

bend av
*water dam*

se'et
*clock (f)*

dan, bide
*give (v)*

cil u berg
*clothes and accessories*

## Texmînê Bike!

© 2006 by Şirîn - jeenuazadi@cs.com
not to be sold except by Şirîn; for free distribution only

Şivan Perwer
*Shivan Perwer (singer)*

Zaxo
*Zakho*

mêze
*desk (f)*

guhê xu dan, guhê xu bide
*listen (v)*

fêyezan
*flood (f)*

## Texmînê Bike!

© 2006 by Şirîn - jeenuazadi@cs.com
not to be sold except by Şirîn; for free distribution only

bîk u zava
*bride and groom*

dikan
*shop (f)*

ser
*top (m)*

ȟeqî dan, ȟeqî bide
*pay for (v)*

reş u spî
*black and white*

## Texmînê Bike!

© 2006 by Şirîn - jeenuazadi@cs.com
not to be sold except by Şirîn; for free distribution only

mamosta
*teacher*

baxçê gîanewera
*zoo*

mast u penîr
*yogurt and cheese*

misaȟe kirin, misaȟe bike
*erase (v)*

murkirin
*signature*

## Texmînê Bike!

© 2006 by Şirîn - jeenuazadi@cs.com
not to be sold except by Şirîn; for free distribution only

Kazem el Sahir
*Kathim el Sahir (Iraqi singer)y*

Xabîrê Dicile
*Tigris River*

sênî u qazan
*plates and pots*

silav kirin, silav bike
*greet (v)*

tuz
*dusty*

## Texmînê Bike!

© 2006 by Şirîn - jeenuazadi@cs.com
not to be sold except by Şirîn; for free distribution only

xuş mirov
*gentle*

nihal
*valley*


PUK
*Patriotic Union of Kurdistan*
*(political party)*

lê gerran, lê bigerre
*look for (v)*

reng u rî
*color and cheek (a bright shiny face)*

# Jîana Min

Ev wêne dirist kirin ji laê Sohêl Ahmed ji bajêrê Dihukê, Kurdistana ‘Îraqê, 2006.




© 2006 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.